# PÊLA XÎZÊ REŞ

- Navê Pirtûkê: Pêla Xîzê Reş
- Janra Pirtûkê: Kin çîrok
- Daner: Xêrî Bozanî
- Derhênana Hunerî: Hesen Umer
- Çapa Yekem: 2018
- Weşanxaneya:
- Hejmara Spartinê:
- Hemû maf ji bo nivîskar parastî ne.

**Gelek sipas ji birayê hêja:**
**Besam Mistefa re,jiber veguhastina vê pirtukê bo ser tîpên latînî.**

**Xêrî Bozanî**

# Pêla Xîzê Reş

**Kin çîrok**
**2018**

**Ji**
**Qurbaniyên**
**jenosîda Êzdiyan re**
**diyarî ye.**

## Bi kurtî…

Pêla Xîzê Reş: Pêla hizra gemarî, pêla hovên dirinde, pêla diz û cerdevanan…
Komeke çîrokên kin anku kurtîleçîrok,rengvedan û dengvedana êriş û xezwa terorîstên DAIŞê li ser devera Şingalê ye, ligel çend kin çîrok yên din ku hinek diyardeyên civakî,siyasî û mirovatî nîşan didin.
Ez dideynim ber sîngê we yên hêja û,daxwaza lêborînê ji her şaşiyekê dikim.

**Xêrî Bozanî**
**11.11.2017**




Dema beyraqa reş
hildan..şaristaniyet hilweşiya.
***

Bi şev serê  xwe danî ser balîfê: “Ya Xwedê tu li halê (heftî û dû)milleta û pêta me jî  werî rehmê…”
Sibehê…bi dengê (Allahû ekber) şiyar bû, rev…serjêkirin…revandin.. talankirin.

***

Zarok ne ji bo şîr digiriya, ne jî laşê wî diêşiya, lê ji ber qîrrîna diya xwe bû, dema bavê wî serjê dikirin

***

Ji zarokekî pirsîn:

- Ka diya te?
- Di destê DAIŞê de ye.
- Ka bavê te?
- DAIŞê serê wî jê kir.
- Ma tu li ku derê dijî?
- Bi xemên wan re.

***

Piştî ku DAIŞê hemû malbata wî revand, çû mal dibe ku wêneyên wan bi dîwar ve bibîne, lê dema gihîşt…dîwar jî nedît.

***

Rizgarbûyek:
Wan tenê ji bo cejna xwe serê berxan jê dikirin, lê em her roj dikuştin.

***

Wê tenê dixwest rastiyekê bizanibe, erê gelo ew pakîze ye, yan jin e, yan jinebî ye, yan jî berdayî ye!! Dema nezanî…tif kire erd û esmanî.

***

Dema DAIŞê hemû meriv û xizmên wî kuştin û revandin, wî fêm nedikir bigirî. Dema fêm kir, klîns difrotin, da pê bijî.

***

Gulleyên DAIŞê şerm dikirin di sîngên jin û zarokan re bifirin, lê ji tirsan nediwêriyan xwe sar bikin.

***

Kêra xwe li ser stûyê wî bir û anî…û bi navê Xwedê, ewê Xwedê çêkirî, ji nav bir.

***

Piştî ku Guran Bûka wî ya lastîkî alastin, gez kirin, parçe parçe kirin…ji nû ve wî bûka xwe vehewand, xemiland û pê re jiya.

***

Herdem digiriya…lê hêsirên wê nediketin ser qada ku bav û birayên wê lê hatin kuştin û ew jî lê hate herimandin.

***

Piştî kezeba wî ji destên DAIŞê rizgar bû, jê re got: Bavo, ez pir ji te hez dikim û ez dixwazim (Allah) jî mîna min ji te hez bike, lewma divê tu şehdeya xwe bînî û nimêj bikî!

***

Pelekî êgir danîn ser dilê wî bavê ku keça wî di destên DAIŞê de û çaverê kirin…di dawî de ne pel vemirî û ne jî dilê wî bêtir şewitî.

***

Li hemû Qamûs û Ferhengan geriya,ji peyva“serjêkirinê” gunehkartir nedît.

***

Sê zarok:
- Ku ez mezin bûm ez ê bibim Doktor.
- Ez ê bibim Mamoste.
- Lê ez ê bibim Pîlot.
Piştî çend mehan, hersêyan hevdu li kolanên koçberiyê dît.

***

Hov li her cihî peyda bûne, li mal…li kolanan…li ser kar, hemû hov in, yên ne hov jî xwe kirine hov, bi hêviya dema ku bimirin bibin milyaket!

***

Fermanê herdu bira ji hev cuda kirin, yek di bin konê koçberiyê de mir, yê din bi destên DAIŞê hate kuştin.

***

Di bin kon de, her şev di hembêza diya xwe de di xew ve diçû, sibehê radibû serê wî li ser erdê ye û balîf hembêz kiriye.

***

Koçberan di qula kon re li esmanê Reş dinerîn, ji nû ve nas kirin ramana (Allahû ekber) çi ye…

***

Zarokekî pêxwas ji beqal pirsî:

- Ev Pêlav bi kêrî min tên?
- Erê…ji bo te baş in…

Bilez bazda daku bêje diya xwe ji min re bikire, li nîva rê hate bîra wî ku ew sêwî ye.

***

Eger zivistanê şerm bikira nedihat, heta derbider neçûbana ser malên xwe.

***

Kurên xayînan, kampên derbideran nîşanî hevdu dikirin.

***

Dema DAIŞê ew girt…gazî dikir (yadê tu bi Xwedî kî dest ji min bernede) Dema ji destên wan qurtal bû digote diya xwe (porê xwe veşêre).

***

Bi şev li ber dengê stranên (Xidr Feqîr) di xew ve çû,
Sibehê ji ber dengê strana Xirabo ya (Mihemed Arif) şiyar bû!

***

Bi hêvî bû here dibistanê û li polê bixwîne û li meydanê yariyan bike û li dikanê biskewîtan bixwe…lê vêga, ew li ber dergehê dibistana wî gundê ku lê penaber e, biskewîtan difroşe.

***

Komeke koçberan: Werin…werin, da em semayeke ehrîmenî li ser milên milyaketên derewan bikin, werin…zû, daku em dîlaneke serxweş li ser destên perwestyarane girê bidin, erê werin…da em her tiştê jê re dibêjin pîroz binpê bikin, her tişt derew e, ya rast ew e ku em lê meyze dikin…kuştin…revandin…wêrankirin…talankirin…derbiderkirin.

***

Koçberek:
Konê min spî ye,berf jî li ser ketiy e, esman spî ye, tenê bextê min reş e.

***

Di fermanê de dilopeke avê bi dest wî nediket, lê çem û robarên xwînê diherikîn.

***

Dema serê wî jê kirin û ew çû cem Xwedê, rabû dozek li ser (Allah) pêşkêş kir.

***

Li ser parçe kaxezeke bêpergal nivîsîbû – ez ê xwe bikujim çimkî bêyî dilê min meymûnek bi min de vereşiyabû.

***

Min zanî dema ew wêneyên xwe bi tifingeke quflkirî ve dikişînin û belav dikin, dê neviyên min, min wek tirsonek wesf bikin!.

***

Li hêviyê bû narîna xwe veguhêze, lê nizanîbû narîna wî wê bibe nalîna wî.

***

DAIŞiyek:
- Tu çi diperêsî?
Yê Şingalî:
- Ez Xwedê diperêsim.
- De naxwe here ba wî…(Allahû ekber)…û serê wî jê kir.

***

Miletek êvarê raza…sibehê hate kuştin û revandin û talankirin û derbiderkirin.

***

Yê Iraqî…kezeba wê jê stand û ew jî bi pêncî Dolaran firote yekî Tûnisî

***

Li *Sûq Al nexase* (bazara kirîn û firotina koleyan)…
- Keç e, 14 salî ye…zirav e…bedew e…bi 60 Dolaran!
- Gihîşte min…
- Dayik bi zarokê xwe ve…bi 100 Dolaran
- Gihîşt bîne…

***

Li ser maseya qumarê Miletek ji nav çû.

***

Di destpêkê de, Amerîka li ser rewşa Gundê Koço got: Tiştek naqewime, her tişt di bin kontrolê de ye…paşê got: Em (qeleq) in “nîgeran – dilgiran” in…di dawî de got:Tiştê ku qewimî li dijî prensîbên mirovatiyê bû!!

***

Dema bi dilbera xwe re zewicî, bû aşiqê yeke din.

***

Armanc û serkeftin ji ferhenga xwe avêtin û xewn û hêvî danîn şûna wan.

***

Dema kembera TNT girêda da xwe bi xelkê de biteqîne…dît xelk bi xwe dişewite.

***

Hemû kulên xwe ji bîr kirin û bûn çalakvanên Facebook ê!.

***

Gava merasîmên ahengê bi dawî hatin,demildest merasîmên perwestebûnê dest pê kirin.

***

Piştî qelereşkê cihê xwe girt, bilbil zanî êdî awazên wî nakevin ti guhan, rabû koç kire cihê ku qelereşk jê hatibû.

***

Çiqasî li ferhenga xwe geriya, ji xeynî peyva serjêkirinê, ti ramanên din ji xwe re nedîtin.

***

Di Odeya min a dudilî de, her tişt li ber çavên min dibin rewrewk û cot.. cot têne min û dixdixankên min vedikin, her parçeyeke laşê min bi xwe diçe û li Odeyên cînaran penaber dibin.

***

Qutiyeke ava germ pênc mirov ji mirinê xelas dikirin, gulleyeke germ mala pênc kesan xirab dikir.

***

Kerek û kûçikek û şivanek…hezar pezan diçêrînin û pez şikirdar e.

***

Wî hemû dem û şiyanên xwe ji bo xweşkirina rewşa wan terxan kiribû, wan hemû dem û şiyanên xwe ji bo têkdana rewşa wî terxan kiribûn.

***

Ew çend sal bûn ligel Birrno û Berfê li dijî neyaran xebat dikir…li ser haziriyê, wan neyaran xîz bi çavan de kir û serê wî bi şûr birrîn.

***

Decal û xapînokan, rabûn rastî û derew tevlîhev kirin.

***

Dara mezin gote ya biçûk: Ez ji te bilindtir û mezintir im. Lê vegerand: Ez dizanim…lê rehên me yên di axê de û serên me jî wê her bêne birrîn.

***

Salvegera wî ya şêstan û destên wî yên mivretî û bêhna devê wî ya kujek û xeber û galegalên wî yên zivir…hîştin Nazdar dawiyê li bîst û yek salvegera xwe bîne.

***

Ew helbesta bi xwîna cegera xwe jê re vehûnabû, (Like) jî nekir.
Hêsira ji çavî bariya, rêyeke dirêj da ber xwe, heta gihîşte ser lêvê.

***

Cejna we pîroz be û her sal nola(wek a) par be.

***

Ez bi roj Behr im û bi şev kakilpûç im(Xirş im).

***

Berîkên giregiran bûne Sêgoşeya Bermudayê.

***

Rêveberê şûnwaran, serên rimên çemandî vedîtin, ji wî xelkî re got: kalên we hatine kuştin.

***

Min bêhna gulan ji ya xeman cuda nekir.

***

Jê çêbû, xwîn û şîrê wê vexwar, wê parast û perwerde kir. Ya din bi xwe anî û nifş jê çêkir...lê ew her xwe ji wan çêtir û bilindtir dibîne!

***

Di tariyê de peyda bû, reşpoş kirin, jiyana wê tarî kirin, di dawî de kefenê spî li wê kirin.

***

Wan bi şev bi birrnoyên xwe şer dikirin. Ev bi roj bi kompaniyên xwe diziyê dikin.

***

Sibe cejn e, em ê herin goristanê.

***

- Bavo, ji ber çi qebra bavkalê me yê kevn ne li goristana gund e?
- Kurê min, ew li goristana kafiran e...
- Çi? Çi? !
- Ne tiştek...tew tu çima evqasî pirsan dikî?

***

Yadê ez çawa hatim dinyayê? Kurê min, me te li ber deriyê Mizgeftê dît. Ji hingê û vir ve, ew ji jiyana kolanan û serberdayî hez dike.

***

Bi dûmana cigareya xwe… serûçavên ên li dîwanê bi boksan reş û şîn kirin.

***

Dema tiliyên xwe li Tîpên kîbordê xistin…da binivîse, Qelemê ew fena kesekî bê nan û xwê wesf kir!

***

Xwêdaneke hûr makyaja li ser rûhên wê vemalişt û bedewiya wê xuya kir.

***

Ne di temenê zaroktiyê de bisiklet ji wî re hate kirîn…ne jî di kalemêriya wî de rûniştoka çerxdar jê re misoger kirin.

***

Di zivistanê de dar dişewitî…di havînê de ew şewitî.

***

Eger tu vê carê jî hatî, hêdî hêdî were, şiyar bî pê li ser wan bîranînan nedeynî, bihêle bi mirina xwe aram bin, eger tu gihîştî zîqîniyê ji deriyê dilê min neyînî, da hizrên min şiyar nebin.

***

Wê gula xwe da wî, wî tovê xwe da wê, wê berê (nifşê) xwe da wan.

***

Dengekî hêdî di guhê wî de kir pistepist: Çi de`wa ye wisa giran difroşî! Guneh e!!!

***

Dema ji barîna baranê bêhêvî bû…rabû hêsirên xwe barandin.

***

Bi wan lingên gemarî hevîr vestrand, tenûrê jî nanê heram avêt.

***

Diya xwe ya pîrejin tenê hişt û qesta Ewropayê kir, dema ew çû ber rehma Xwedê, wî behiya wê li ser Facebook ê kir.

***

Doktor: Peyameke xweş û yeke nexweş hene ez bêjime te…ya xweş, tu ne dîn î û ya nexweş, kerem bike ji dînxanê derkeve û here.

***

Jê re gotin: Jixwe ger tu bi kêrî tiştekî jî neyî, tê sibe bibî zêrevanê bîrên gazê…dema bûne xwedî gaz…zêrevanên biyanî nehiştin daxwaziya damezrandina xwe – wek zêrevan – bibe cem rêveber

***

Min hişt bêyî min bijî, rabû ez bi mirina xwe kuştim.

***

Jê re got: Tu çiqasî herî û werî û dûr û nêzîk bibî, tê her vegerî hembêza min, ez hêlîna te me

***

Ti caran destên te yên qerisî û lêvên te yên sar nikarin henasên min ên germ bikin hilm û ewr jî jê çênabin û axa me wê her û her stewr bimîne

***

Hilo rabe ji xewê, dema razanê ye, ji te re şerm e heke tu gavekê bi pêş ve herî

***

Li vî warî hemû tişt mezin dibin, her tişt dizê û dibe du, tenê yê biçûk dibe mejî ye

***

Nexwestin agirê ku bi xaniyê wan ketibû bi avê vemirînin, tirsiyan di havînê  de ji tîna bifetisin

***

Çîroka mirovan......
Destpêk: Girî…qîrrîn.
Naverok: Xem, kar, kêf û kul.
Dawî: Girî…qîrrîn…

***

Di rojên propagendên hilbijartinan de stûnên elektrîkê bi wêneyên xwe xemilandin, piştî bi serket, elektrîkê ronahî neda wan wêneyan

***

Dema piştî Buhara Ereban payîz hat, me zanîbû ku miletên Erebî kordûnde ne

***

- Kê te kuşt?
- Min xwe kuşt.
- Kê te kuşt?
- Min xwe şewitand.
- Tu li mala Heq î…bêje kê te kuşt?
- Wî hişt ez xwe bikujim…wan hişt ez xwe bişewitînim

***

Roj baş zaroka delal, kes li mal heye? Na…tenê ez û diya min in

***

Kurê min..ne bi şev be dernekevî, çimkî bi roj yan tê bê şelandin…yan jî tê bê kuştin

***

Zêrevanên me mijûlî çat û Facebookê ne!

***

Di dema ciwaniyê de nebû bixwe, di temenê kalbûnê de hebên kolesterolê dixwarin

***

Razî nebû gustîla diya wê dayê bide keça xwe…çaxê neviya wê mezin bû jê re kire diyarî

***

Ez ti caran ji reşiya şevê netirsiyame…lê reşiya dilan ez bizdandime

***

- Cigare: Ez ê xwe ji bo te bişewitînim.
- Cigarekêş: Ez ê xwe bi te bikujim

***

Kurê min ew hemû lîstik û tirimpêlên zaroktiya min ên ku ji têl û teneke û lastîkê çêkirî…di Facebooka xwe de belav kirin

***

Heta berî ku yê mirî berjêrî tirbê bikin, hemû bûbûn welî û behsa rêya rast a Xwedê dikirin…dema pişta xwe dan goristanê, wey li wî û bavê wî bi xirabî behsa yên ne hazir bike û ji hev re tevnan raçinînin

***

Dema hemû balindeyan nekarîn mîna bilbil awazan bijenin…rabûn serê bilbil bi heytehol û qerebalixa xwe gêj kirin

***

Piyaleya araqê doktorê derûnî yê herî baş e

***

Baş e yadê bi xatirê te va ez çûm dibistanê, dilê te bi min ve nebe…bixêr biçî kurê min…na na dilê min bi te ve nabe…êdî tu mezin bûyî, bes ku tu gihîştî ji bîr neke telefona min bike

***

Dema dîkê mezin serjê kirin, hezar dîkên din bang dan

***

Piştî ku çar kur anîn, ya pêncan keç bû, ji nû ve kêfa wê hat û got: Ji nû ji bo min hêvî çêbû ku giraniya karê malê dê li ser me herduyan bê parvekirin û dê barê min sivik bibe

***

Ez di asansorê de bûm, keçek derbasî hundir bû û got:

- Roj baş..tu çawa yî, baş î?
- Roj baş, tu bixêr hatî….

Lê rengê min zer bû dema min zanî ew bi rêya bluetoothê bi yekî din re diaxivî!!

***

Dema ji bilindiya xwe kete xwarê, toza ku ji ber wî çû çavên haziran kor kir

***

- Tu ji ber çi mala xwe wêran dikî?
- Ez tenê pişkdariyê di xirabkirinê de dikim!

***

Hêviya balgiyê wî ew bû şevekê bi zuhayî rakeve

***

- Bes ez hevjînê te me!!
- Aha…anku tu ne efserê min î

***

- Yabo, mobayl û laptop di biheştê de hene?
- Helbet hene û balans û şarj jî ne lazim in

***

Piştî meymûn hejmarek neştergeriyên bedewiyê ji xwe re çêkirin…bû hirç!!

***

Çiqasî lêvên xwe sor bike…ewqasî peyvên reş ji nav wan derdikevin

***

Daku çavên xwe baş biçêrîne, berçavkeke reş li xwe kir

***

Ew kindira pê hate xeniqandin, nehişt ji dilên xelkê derkeve

***

- Dayê, ji ber çi neheng gelekî qelew e?
- Dayê bi gorî, çimkî wî heyv daqurtandiye

***

Zû ji bo min kumekî hesinî bînin, çimkî min rastiyek gotiye

***

Dema mejiyê wî bi ereqê serxweş
kirin, stranek got û raza.
Dema mejiyê wî bi axaftinê tijî
kirin, xwe teqand û mir

***

Zilamê dilhişk hizr dike ku ew bi
şev jî tolan vedike

***

Ji pêlavê pirsîn: Kî ji te kêmtir e?
Got: Yê ku min diavêje yê beramber

***

Ew pereyê didizî li pişt wêneyê
serkirdê mezin, yê ku li rasta serê
wî yê helawîstî, vedişart

***

Dê gelî şagirtan her yek ji bo min
babetekê li ser xirabiyên
xwekuştinê binivîse.
Hemûyan wêneyê terorîstekî
kişand

***

Arîşe û pirsgirêkên yê zengîn gelek in: Milyonên dolaran, bi hezaran kargeh û xanî û apartman û tirimpêl û…çar jin û panzdeh zarok û…
Arîşe û pirsgirêkên yê feqîr kêm in: Qetek nan û lihêfek.

## Nivîskar di çend rêzan de
**Xêrî Bozanî**
**(Xêrî Ilyas Elî)**




Sala 1970 li gundê Boza, Nahiyeya Elqûş, Parêzgeha Neynewayê ji dayik bûye. Bakaloryusê Ziman û Edebiyata Kurdî ji Koleja Edebiyatê ya Zanîngeha Selahedînê wergirtiye.
Karên mamostetî, rojnamenivîsiyê, rêxistinên civaka sivîl, siyasî û kargêrî kirine.

### Ji berhemên wî yên çapkirî

1. Amadekirina 12 pirtûkên programa Êzdyatî kiriye bi pişkdarî, Hewlêr, 1999.
2. Helameve, Helbest, Dihok, 2001.
3. Xewneke Amerîkî, Komeke Çîrokên Ezîz Nesîn, Wergerandin, Dihok, 2006.
4. Mişk Hevdu Dixwin, Komeke Çîrokên Ezîz Nesîn, Wergerandin, Hewlêr, 2007.

5. Dêran, Nivîsên Îronîk, Dihok, 2011.
6. Mîr Caferê Dasinî, Lêkolîneke Dîrokî, Hewlêr, 2011.
7. Barzanî, Şanogerî, Ehmed Îsmaîl, Wergerandin, Dihok, 2011.
8. Zeviya Asê, Şanogerî, Ehmed Îsmaîl, Wergerandin, Hewlêr, 2013.
9. Ezîz Nesîn, Gotar û Lêkolînên Edebî, Hewlêr, 2018.
10. Pêla Xîzê Reş, Kurteçîrok, Hewlêr, 2018.

---

**Ji bo pêwendîkirinê**
Khairi_bozani@yahoo.com
009647504676173